



Unterricht in Heimatlicher Sprache und Kultur (HSK)  
Informationen für Eltern

## Hîndekariya bi ziman û çanda zikmakî (HSK) Agahdariyên ji bo malbatan

Gelek mirov îroj di nava danûsitendineke pir-çandî de dijîn. Ev yek qasî jiyana taybetî di jiyana rojane ya kar û xebatê de jî wiha ye. Destekdana pîrzimanî û ya danûsitendina navbera çandan, ji ber vê yekê girêdayî erkên grîng ên li dibistanê ne. Ev armanc bi hîndekariya ziman û çanda zikmakî ya ji aliyê serkariya perwerdehiyê tê destekdan ve jî tê şopandin. Li kantona Zurichê niha nêzî deh hezar zarok û ciwan, vê derfetê bikar tînin.

### Hîndekariya HSK çi ye?

Li kêleka hîndekariya li dibistana seretayî ya gelek zimanên ne-elmanî ne; ji pêşniyara hîndekariya ziman û çanda zikmakî (HSK) pêk tê. Di hundirê vê hîndekariyê de, zarok û ciwanên xwediyê du zimanan, jêhatiniyên ji zimanê dayikê (zimanê zikmakî) tên, pêş de dibin. Derveyî vê yekê, di derbarê çanda welatê xwe de (mînak: li ser dîrok, erdnîgarî, wêje û kevneşopî) dibin xwedî agahî.

### Fêdeyên hîndekariya HSKê

- Zarok û ciwan jêhatiniyên xwe yên zimanê zikmakî, bi rêka xwendin û nivîsandinê ji aliyê têgihîştin û axivtinê ve xurt û kûrtir dikin.
- Yeke/yekî zimanê zikmakî baş zanibe, wekî zimanê duwemîn almanî û zimanên din ên biyanî hêsantir hîn dibe.
- Zanîna di asta pêş de ya bi zimanê zikmakî, alîkariyê dide parastina têkiliyên bi malbat û xizmên xwe re.
- Xurtbûna di zimanekî din de jî, di jiyana kar û xebatê de ji mirov re bi awayekî erênî dibe alîkar.
- Jêhatiniya zimanzaniyeke xurt û çê, têkilîdanîna bi welêt re hêsantir dike. (ji bo berdeyamkirina xwendina dibistanê, ji bo vegera welêt, ji bo kar û xebatên pîşeyî)
- Hîndekariya HSKê bi gelemperî asta serkevtina hînbûnê ya li dibistanên fermî ya wekî xurtkirina baweriya bi xwe û zanîna li ser cîhanê diparêze.
- Zarok hîn dibin ku çanda welatê dayik û bavê xwe baştir nas bikin û dîsa hîn dibin zêdetir bala xwe bidin ser têgihîştina rewşa xwe ya li Swîsre. Ev parastina jêhatîbûnê dike ku bi çandên cûr bi cûr re bide û bistîne û bi civakê re bike yek.



### Malbat çawa dikarin pêşdebirina pirzimanîya zarokên xwe biparêzin?

- Hûn bi zaroka/zarokê xwe re bi zimanekî ji ber xwe û xwezayî ji devê we dertê ku hûn baş dizanin biaxivin - pirahî ev yek zimanê zikmakî ye. (Ev guman çewt e ku dibêje, gava dayik û bavê xwediyê zimanekî din, bi zarokê re bi almanî biaxivin, gelemperî wê rehetir bike.)
- Di axavtina bi zaroka/zarokê xwe re zimanê dayikê û yê almanî tevlihev nekin. Tevî ku ew bi almanî bersiv bide jî, hûn axavtina xwe bi zimanê zikmakî bidomînin. Lê bihêlin bila zarokên we bi xwe biryarê bidin bê dixwazin bi kîjan zimanî we bibersivînin.
- Gava dayik û bav bi zimanên cuda cuda diaxivin, hûn dikarin vê yekê bi zarokên xwe re jî bikin. Li vê derê ya grîng rêzikeke zelal e: „Dayik bi vî zimanî diaxive, bav bi zimanekî din, dema em tev bi hev re dixwin, em wiha diaxivin.“
- Gava aloziyek derket li paş mexin: dibe ku di wê kêlîkê de zaroka we tevî bi zimanê zikmakî têdigihêje jî bi tenê elmanî biaxive. Gava hûn di axavtina bi zimanê zikmakî de bidomînin, zarok wê têbigihêje guhdarîkirinê bidomîne – û bê guman bi misogerî wê pişt re vî zimanê zikmakî dîsa bikar bîne.
- Alîkariya zaroka/zarokê xwe bikin ku zimanê dayikê li xweşiya wê/wî biçe û ji zimanê zikmakî bi rêka ravekirina we ya rojane, guhdarîkirin, bi hev re nêrîna li pirtûkên bi wêne û xwendin, axavtina zûgotinok û metelokan, gotina stranên û bi vegotin ango xwendina çîrok û çîvanokan kêfxweş bibe.
- Ji zarokên xwe re derfetan biafirînin ku kesekî sêyem ê jê re wergerîne li cem tinebe jî karibe zimanê zikmakî bikar bîne (şandina betlaneyê -ya cem xizmên xwe û hwd.)
- Bila zaroka/zarokê we ji biçûkbûnê vir ve xwediyê têkiliyên bi zimanê almanî be. Hûn jî ji hînbûna vî zimanî re vekirî bin. Ji bîr mekin ku hûn ji zarokên xwe re wekî mînak in.
- Zarokên xwe (bi qasî hûn bikarin - dema diçe hêlîna zarokan) bişînin hîndekariya HSKê û bila her car ji we re bîne ser zimên bê li wir hînfî çî bûye.
- Bi kesên li dibistanê hîndekariyê dikin û hîndekariya HSKê re her dem di nava peywendiyê de bin.

### Saziya hîndekariya HSKê

#### Kî hîndekariyê dike?

Hîndekariya HSKê yan ji aliyê sefaretxane, (wekî balyozxane û hwd.) yê welatê jê hatine yan jî ji aliyê saziyên taybet ve tê sazîkirin û fînansekirin. Ew li dibistana seretayî bi zagonî wek kesa/kesê hîndekariyê temam dike erkdar e. Endamên hîndekariya HSKê bi endamên hîndekariya dibistanên asayî re, bi hev re dixebitin. Salê carek, du çaran malbatan vedixwînin êvara agahdarkirinê.

#### Serlêdana zarokan

Hîndekarî dikare ji asta hêlîna zarokan heta refa yekem û duwem a dibistana seretayî û ji temenê çar salî pê de bê dayîn. Serlêdan dikare ji aliyê dayik ango bav ve li ser internetê bi girêdanka [www.vsa.zh.ch/hsk/anmeldung](http://www.vsa.zh.ch/hsk/anmeldung) were kirin. Dema dayik ango bav bixwazin dikarin ji kesên hîndekar ên hîndekariya HSKê bi rê ve dibin, formulareke serlêdanê bistînin ango raste rast serî lê bidin. Navnîşana peywendiyê li jêrê ye.



Demên hîndekariyê

Xwendekar di hefteyekê de 2-4 dersan dikarin bibînin. Ev yek girêdayî demên bikarhatina dibistanê ye, bi pirahî piştî dersên asayî ango roja şemiyê ye.

Cihê hîndekariyê

Hîndekariya HSKê li refên (odeyên) dibistanên seretayî û li gorî derfetan li cihekî nêzî rûniştgehên zarokan tê dîtin.

Deqên di bawernameya dibistana seretayî de

Mamosteyê hîndekariya HSKê asta fêrbûna zarokan a di hînbûna HSKê de bi deqên ji 1-6 an di pelikandinekê de bi peyitandin dinirxîne. Mamosteyên refê van deqan derbasî bawernameya dibistana seretayî dikin. Pirahiya welatan, kesên tî hîndekariya HSKê, wekî fermî dipejirînin.

Saziya Perwerdehiyê ya Kantona Zurichê

Hevkariya bi kursa destekdayîna zimanê zikmakî û çanda welêt (HSK) re

Navnîşana peywendiyê / Kontaktadresse

Komeleya Hîndekariya Kurdî  
Verein für Kurdischunterricht  
Postfach 3616  
8021 Zürich  
[zimanekurdi.hsk@gmail.com](mailto:zimanekurdi.hsk@gmail.com)

Kontaktpersonen:

Nicole Weiss: 076 541 79 85  
Hasan Deniz: 078 608 79 14

Fassung Oktober 2013; aktualisiert Dezember 2016